

Advent

Advent ji çar hefteyên paşîn ên beriya sersalê re tê gotin. Advent, di eslê xwe da amadehîya pîrozbahîya cejneke mesîhî ya ku ji bo jidayîkbûna Îsa ye. Peyva Adventê di bingeha xwe da tê wateya “Xwedê tê”. Di roja me ya îroyîn da, mesîhî bin yan nebin jî, vê rojê pîroz dikin.

Di dema Adventê da her mirovek li gorî xwe, xwe ji bo Noelê amade dikin. Gelek mirov mala xwe dekore dikin. Di dema Adventê da li dibistanan û baxçeyê zarokan gelek çalakî tîn lidarxistin. Rengê Adventê bînevî ye.

Kulîçeyên Noelê

Di dema Adventê da gelek kulîçeyên Noelê çêdikin. Li gorî kevneşopîyê divê yek heft cureyên kulîçeyan çêkê. Lê kirîna kulîçeyan a ji marketan jî gelekî belav e. Ji heft cure kulîçeyan yek jî kulîçeya bi zencefîle. Hin mirov ji wan jî kulîçeyên bi zencefîl xaniyên biçûk çêdikin.

Li bajarê Bergenê her sal mezintirîn bajarê ku ji kulîçeyên bi zencefîl tê amadekirin. Dibistan, baxçeyê zarokan, kargeh an jî şexsî, xaniyê kulîçeyên xwe ku çêkirine didin sazîyeke. Sazî ku bi wan kulîçeyan ‘bajarê kulîçeyên bi zencefîl’ sererast û pêşkeş dike.



Bajarê kulîçeyên bi zencefîl li Bergen. Wêne ji aliyê straightfromthecask li ser malpera Flickr ve hatiye girtin.

Hunergeha Noelê

Gelek kes di dema Adventê da hunergehên Noelê amade dikin. Bi saya hunergehê heval û malbatên xwe vedixwînin û bi hev ra demeke xweş derbas dikin. Di hunergehên Noelê da xemlên Noelê, dîyarîyên Noelê û qertên Noelê tîn amadekirin. Hinek kes di hunergehên Noelê da stranan dibêjin û muzîka Noelê guhdar dikin.



Zarokan bicuk li muzeya Oslo qertên Noelê amadekirine. Wêne: Oskar Seljeskog, Oslo museum

Bidawîbûna Noelê

Dibistan, baxçeyê zarokan, kulubên werzişê û komele di dema Adventê da çalakîyan li dar dixin. Van çalakîyan weke bidawîbûna Noelê binav dikin.

Konsert û şahîyên Noelê

Gelek stranbêj û hunermend konsert û şahîyên Noelê amade dikin. Ev çalakî bi gelenperî li dêrê tîn lidarxistin.

Bazara Noelê

Bazarên Noelê jî di dema advantê da gelekî tîn dîtin. Di bazara Noelê da atmosfereke gelek xweş ku ji çandekê kevn tê heye. Mirov dikare ji vir dîyarî û xwarinên Noelê yê ku bi destan hatine çêkirin bikire.

Salnameya Adventê

Gelek zarok di Noelê da xwedî salnameyekê ne. Di nava salnameyê da bîst û çar dîyarî hene.

Zarok ji serê berfenbarê (desember) heta êvara jidayîkbûna Îsa, her roj dîyariyekî ji bo xwe vedikin.

Di gelek polên dibistanan da jî salnameyên Advantê hene. Her xwendekar dîyariyeke paketkirî bi xwe ra tînin. Mamoste jî nîşeyên ku navên zarokan li serê ye amade dîke - ji bo her xwendekarî nîşeyek. Her roja berfenbarê nîşeyek tê kişandin. Navê kê derkevê dîyariya rojê didin wî/wê. Salnameya Adventê ya hin mirovên mezin jî heye. Di înternetê da gelek cure salnameyên Adventê tîn dîtin. Çanda salnameya Adventê li derdora sala 1920'an da ji Almanyayê hatîye Norwecê.



Salnameya Adventê. Wêne ji hêla Ulrike Mai li ser malpera Pixabay hatiye girtin

Mûmikên Adventê

Çelengên Andventê, ew mûmdankin ku ji çar mûmikan pêk tên. Ji bo her yekşema di Advantê da mûmikek heye. Di Adventê da yekşema yekemin mûmikekê pê dixin, yekşema duyemîn du mûmikan pê dixin. Di çaremin yekşema Adventê da her çar mûmikan pê dixin. Gelek şikil mûmdankan hene; hin ji hesin, hin ji seramîk yan jî hin ji alavên din tên çêkirin. Çanda mûmdanka Adventê weke salnameya Adventê û dara Noelê ji Almanayê hatîye Norvecê.

Qesîdeyên Adventê

Dema mûmikên Adventê tên pê xistin bi gelenperî di ber ra qesîdeyên Adventê jî tê xwendin. Gelek cure qesîde Adventê hene. Hûn dikarin li jêr qesîdeyê naskirî bixwînin. Qesîde ji hela Inger Hagerup hatîye nivîsîn. Di vê qesîdeyê da qala pêxistina mûmikan ji bo hêvî, bêrîkirin, dilşadî û aşîti ya li ser rûyê erdê tê kirin.

Advent

Så tenner vi et lys i kveld, vi tenner det for glede.
Det står og skinner for seg selv og oss som er tilstede.
Så tenner vi et lys i kveld, vi tenner det for glede.

Så tenner vi to lys i kveld, to lys for håp og glede.
De står og skinner for seg selv og oss som er tilstede.
Så tenner vi to lys i kveld, to lys for håp og glede.

Så tenner vi tre lys i kveld, for lengsel, håp og glede.
De står og skinner for seg selv og oss som er tilstede.
Så tenner vi tre lys i kveld for lengsel, håp og glede.

Vi tenner fire lys i kveld og lar dem brenne ned.
For lengsel, glede, håp og fred, men mest av alt for fred
På denne lille jord, hvor menneskene bor.



Adventsllys. Bildet er tatt av Myriam Zilles på Pixabay